

# BOTAN TIMES

EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

## GELO KIZILAY DIKARE KONAN BIFROŞE?

BOTAN TIMES

Mexdûrên erdhêjê berê xwe  
dan erebeyên hemalan

Beril Caymaz

Jiyana piştî erdhêjê:  
Em neçar in neçar!

Gulistan Korban

"Bajarên me li ser xetên fayê  
hatine avakirin"

Gulistan Korban



# EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

20 - 26 SIBAT 2023 · JIMAR 6 · SAL 1

**BOTAN TIMES**

*Nûçeyên kurdî, standardên navneteweyî...*  
Xwedî

**Botan International Medya Ltd. Şti.**

Edîtor/Nûçegihan

**Gulistan Korban Rençber**

**Berîl Caymaz**

Edîtor

**Murat Bayram**

Wergêr

**Yonca Sarsilmaz**

Rûpelsazî

**Ridwan Xelîl**

Bergsazî

**GrafîKURD**

[www.botantimes.com](http://www.botantimes.com)



**BOTAN INTERNATIONAL  
MEDYA LTD.**

Xwedî

**Murat Bayram**

Midûr

**Yonca Sarsilmaz**

Pispora Pêşdebirina Çavkanîyan

**Kubra Sagir**

Şêwirmendê Weşanê

**Omer Faruk Baran**

[www.botaninternational.com](http://www.botaninternational.com)

**EUROPEAN**  
ENDOWMENT OF DEMOCRACY

Fona Ewropayê ya Demokrasîyê piştgirîya Botan Internationalê dike.  
Hemî berpirsiyarîya naveroka Botan Timesê li ser Şirketa Botan International Medya Limitedê ye.



### NAVEROK

Gelo Kizilay dikare konan bifroşe? li ser nîqaşan kî çi dibêje? .....	4
Roja 21emîn ya erdhêjê .....	6
Erdhej û tenduristî .....	7
Keça Qazî Mihemedî, Sûheyla Qazî miriye .....	8
Mexdûrên erdhêjê berê xwe dan erebeyên hemalan .....	9
Li Baglêra jiyana piştî erdhêjê: EM NEÇAR IN NEÇAR! .....	10
Roja 18emîn ya erdhêjê .....	12
“Wekî ku rojên me yê berê hildiweşînin” .....	13
“Jiyana me, mala me, Tv û radyoya me bû, niha ew jî çû” .....	14
“14 kûçik û pisîk di vê avahîyê de hene, xera nekin!” .....	16
Roja 17emîn ya erdhêjê .....	17
Endezyarê Jeolojîyê: Bajarên me li ser xetên fayê hatine avakirin .....	18
Roja 16emîn ya erdhêjê .....	20
Erdhêj û penaberî .....	21
Roja 15emîn ya erdhêjê .....	23

# Gelo Kizilay dikare konan bifroşe? Li ser nîqaşan kî çi dibêje?

Botan Times Sibat 26, 2023



Binnivîsa Wêne

Erdhêja Mereşê ku 40 hezar kesan canê xwe ji dest da bê îxmaliya rayedaran jî hedî hedî derdikeve holê.

Rojnameya Cumhuriyetê idda kir ku, saziya alîkariyê ya dewletê Kizilay di roja 3emîn ya erdhêjê de bi 46 milyon lîreyan konan firotiyê komeleya AHBAPê.

Damezrînerê komeleyê Haluk Levent jgot,

*Piştî lihevkirina bi Kizilay Çadır û Tekstil A.Ş re 2050 kon me kirî û ji bo mexduran me şandin herêma erdhejê.*

Piştî derket hole ku Kizilay Tekstil A.Ş ya li şûna konan bişînin herêma erdhejê firotiyê ev jî bû sedema nerazîbûnan.

Serokê Kizilayê Kerem Kinik li ser mijarê dibêje;

*“Hevkariya AHBAP û Kizilayê “exlaqî, aqilane û hiqûqî ye”.*

## Konan firotine Komeleya Dermanfiroşên Tirkîyeyê jî

Nîqaşa konên ku Kizilayê firotiyê Komeleya Ahabapê dewam dike. Lê Komeleya Dermanfiroşên Tirkîyeyê (TEB) ragihand ku Kizilayê konan firotiyê wan jî.

*Serokê TEBê anî ziman ku Kizilay bi 140 hezar lîreyan kon firotiyê wan.*

## “Ger konên te hebû, te çima firot?”

Ji partiyên muxalefetê jî bertek hatin.

Parlementera Partiya Demokratik ya Gelan (HDP) Meral Daniş Beştaş, ji ser hesaba xwe ya Twîttêrê van pirsan ji Kizilayê dipirse?

*Ger konên te hebû, te çima firot?*

*Pereyên ku xelkê bi zor û xehmetê bexş kirin dema we konan firot hat hişê we gelo?*

*Kesên ku gotin, "em wan kesên dibêjin," "Di erdhêjê de AFAD tunebû, Kizilay tûne bû" nîşeyê wan digrin." Haya we Kizilayê heye.*

### **CHP ji Soylu pirsî: Çend kon hatin firotin?**

Parlamenterê Partiya Komarî ya Gel (CHP) Burhanettîn Bulut jî mijarê anî rojeva Meclîsê.

Bulut ji Wezîrê Karên Navxweyî Suleyman Soylu xwest ku bersiva pirseke bide û wiha got:

*"Gelo îdiaya ku Kizilayê kon firotiye AHBAP a saziya sivil rast e? Ji aliyê Kizilayê ve çend kon ji AHBAPê re hatin firotin?"*

### **DEVA: Rewşeke giran e!**

Alikarê Serokê Giştî ye DEVA yê Mehmet Emîn Ekmen jî diyar kir ku;

*Çiqas ku muxaleyên di nava 48 seatan de li herêma erdhêjê nehat kirin rewşeke giran be, firotina konan jî ewkasî mûhîm û rewşeke giran e.*

### **Di derbarê Kizilay Çadır & Tekstil de çi tê zanîn?**

Li gorî malpera Kizilayê, Kizilay Çadır & Tekstil şirketeke girêdayî Kizilayêye û hemû dahata wê ji bo Kizilayê tê veguhestin û di xebatên alîkariyên mirovî de tê bikaranîn.

Di rûpelê de tê destnîşankirin ku tesîsa çêkirina konan ji aliyê Kizilayê ve di sala 1954'an de hatiye avakirin.

Sazî ji bo alîkariya mirovên ji ber felaketê zirar dîtine û bê war mane bike dest bi xebatan kiriye û bi salan ev yek mezin bûye.



# Roja 21emîn ya erdhêjê

Gulistan Korban Murat Bayram Sibat 26, 2023



Antakya, 20.02.2023

Erdhêja Mereşê 21 rojan li du xwe hişt. Erdhêja ku 10 bajaran wêran kir heta niha 40 hezar zêdetirî mirov jîyana xwe ji dest da.

## Ji NYyê bo herêmên erdhêjê daxuyani

*Rêveberê Bernameya Xwarinê ya Cîhanê ya Neteweyên Yekbûyî David Beasley, serdana Antakyayê kir.*

*Beasley, di daxuyaniya xwe ya piştî serdanê de, tiştên ku wî li herêmê dît wekî "Kiyamet" binav kir.*

## "1453 zarok radestî malbatên wan hatin kirin"

*Wezaretê Malbat di derbarê zarokên piştî erdhêjê bêkes mane daxuyani belavkir.*

*Wezaret di derbarê wan zarokan de van daneyan parve kir;*

*"1900 zarokên me yê bêkesên ku ji bin xirbeyan hatin derxistin.*

*1453 zarok radestî malbatên wan hatin kirin, 108 zarok jî li stargehan e.*

*Pêvajoya tedawiya 339 zarokên me tê şopandin.*

*1817 zarokên me yê nasname û 83 zarokên me jî ne diyar in."*

## Rapora erdhejê: Li 3 bajaran rîsk zêde ye

*Akademîsyenên Beşa Endezyariya Jeofîzîkê ya Fakulteya Endezyariyê ya Zanîngeha Dokuz Eylûlê li ser erdhêja Mereşê rapora xwe ya destpêkê aşkere kirin.*

*Di raporê de hat destnîşankirin ku xetereya erdhejê li Semsûr, Meletî û derdora wê û li Dilokê û derdora wê bilind e.*

## Piştî erdhejê 184 kes hatin binçavkirin

*Di encama lêpîrsînên ku piştî erdheja Mereşê hatin destpêkirin de, hat ragihandin ku 184 kes hatine binçavkirin.*

## Erdhêjên biçûk dê berdeyam bikin

*Prof. Dr. Şukru Ersoy got, "Hejmara erdhejên ku diviyabû di 4,5, 5 mehan de li Tirkîyeyê çêbibûna di 3 hefteyan de pêk hat. Em li bîndêne ku erdhêjên biçûk heta du salan berdeyam bikin."*

# Erdhej û tenduristî

Gazete Duvar Murat Bayram Sibat 25, 2023



Hatay, piştî erdhêjê...

## Dr. Eser Çetîn

Piştî erdhêjê yek ji wan rewşên herî bi bandor jî derûnî ye. Nexweşiyên derûnî û psîkolojîk pir çêdibin. Depresyon, anksiyetê, sendroma şûnê-hewariyê, tirs, panîk, xwe bêçare hîskirin.

06.02.2023 saet 04.17an de erdhejek mezin û dîrokî çêbû. Navenda erdhêjê Mereş bû û pir bajar da ber xwe û kete rojeva cîhanê jî. Di serî de ji bo kesên çûne ser dilovaniya xwe xwedê wan bi rehma xwe şa bike û ji nexweşan re şîfa dixwazim, hêvî dikim ji binê kavilan mirov bên xelaskirin. Pir mirov û sazî dî nava alîkariyek mezin de ne. Hêvî dikim ku wê bigihêjin encamên xweştir.

Ez ê bi giştî li ser çend tiştên girîng ê li ser erdhej û tenduristiyê bisekinim. Dibe ku wekî berdeyamî ez li ser mijarên tenduristiyê yên li ser erdhêjê nivîsên din jî paşê binivîsim. Hîpotermî, xerabûna gurçikan, Dehidratasyon, Sendroma Crashê, Sendroma Kompartmanê, Travma, Embolî, Nexweşî û rewşa derûniyê, nexweşiyên teger- vegir ên wekî zikêşê, gurîbûn an jî xurî... hwd. ji pir alî ve mirov dikare rewşê binirxîne.

## HÎPOTERMÎ

Mixabin zivistan e û ji ber ku germahiya laş dikare bikeve û mirov dikare têkeve

hîpotermiyê xetereyek mezin e ev rewş. Demên asayî de germahiya laş kêm zêde 36,5 – 37,2 pîle (derece) ye. Dema germahiya laş dakeve binê 35 pîleyan bandora hîpotermiyê li ser laş xwe hêdî hêdî dide der. Li gora asta hîpoyermiyê jî tade li mirov tê. Kesên ji bin xerabe û kavilan hatine derxistin divê bên germkirin û germahiya laşê wan bê asta normal. Bi betanî an jî kinc û cilan hewce ye nexweş bê nixumandin.

## SENDROMA CRASHÊ

Ji ber eciqandina kas- masûlkeyan masûlke perçe dibin û bermahiyên masûlkeyan an jî enzîmên mayî gurçikê xera dikin û dikare bibe sedema xelasbûn-îflaskirina gurçikê jî.

## XERABÛNA GURÇIKAN

Hem ji ber ku laşê mirov bêav maye (dehidratasyon) û hem jî ji ber eciqandina kas û masûlkeyan barê giran dikeve ser gurçikê û çawa nexweş ji binê xerabeyan hatin derxistin divê bi taybetî bi serûman wendahiya avê bê dayîn. Hewce ye mirov li nexweşxanê bê şopandin û li gora asta êşandina gurçikê dikare hewcedarî bi diyalîzê jî çêbibe.

[Dewama nivîsê](#)

# Keça Qazî Mihemedî, Sûheyła Qazî miriye

Botan Times , Gazete Duvar 25 Sibat, 2023



Sûheyła Qazî li bajarê Bonnê yê Almanayê şeva dî miriye. Sûheyła xan keça damezrînerê Komara Kurdistanê Qazî Mihemedî bû.

Sûheyła Qazî sala 1941 hatiye dinê û di 40 salên xwe yê dawiyê de li sirgunê dijîya.

Temama nûçeyê (tirkî)



# Mexdûrên erdhêjê berê xwe dan erebeyên hemalan

Beril Caymaz 📅 Sibat 24, 2023



Wêne: Gulîstan Korban Rençber

Welatîyên Diyarbekirê yên ku malên wan zirareke mezin dîtine dest bi barkirinê kirin.

Mexdûrên erdhêjê piştî zêdebûna bihayê erebeyên barkirinê ji bo barkirina malan berê xwe dan erebeyên hemalan.

Wêne: Gulîstan Korban Rençber

Em li taxa Dortyolê ya Baglerê ne. Li vê derê hemalên pîr, ciwan û zarok serê sibê kom dibin.

Berê ev kes bi saetan li benda barek û karekê bûn. Hin rojan jî karek jî nedihat û bêrika wan wala diçûn mala xwe. Piştî erdhêjê ev rewş hat guhertin.

Zilamê ku 20 sal in hemalîyê dike ji Botan Times re axivî.

*Em êdî rojê herî kêr 10 malan bar dikin. Bi rastî ev ji bo me rewşeke baş e. Lê*

*dema bêçaretîya wan mirovan dibînim, piştî qedandina karê xwe bi xemgînî pereyê ji wan distînim.*

*Dema em ji bo barkirina xaniyan diçin, destpêkê dibêjin mala me xisar nedîtiye. Lê dema em diçin malê, dibînin ku dîwar û stûn xira bûne.*

*Ez jî wan xaniyan bar nakim ji ber ku bitalûke nin. Xwedîyên malê îsrar dikin, dibêjin emê pere bidin te, lê ez qebûl nakim. Zarokên min hene, divê ez xwedî li wan derkevim, eger tiştek were serê min ew ê bi tenê bimînin. Lê ew ji bêçare ne, neqlîyat pir biha ye.*

Li gor reqamên fermî li bajar ji bo hezar û 100 avahiyên biryara hilweşandina bilezginî hatiye dayin.

Xisara herî zêde jî li navçeya Baglera ye.

# Li Baglera jiyana piştî erdhêjê: EM NEÇAR IN NEÇAR!

Gulistan Korban 📅 Sibat 23, 2023



Li navçeya Baglera şênîyên taxê xaniyên xwe bar dîkin

Di van rojan de di kolanên Amedê de teşqeyek dest pê kiriye.

Piştî erdhêja 6ê Sibatê li bajar bi sedan avahî zirar dîtin. Kesên di wan malan de bûn jî niha di nav hewla koçkirinê de ne.

Di nava bajar de niha koçeke navxweyî heye.

Ji bo dîtina wan avahiyan em berê xwe didin navçeya Baglera.

Dema em li taxa Muradiyeyê digerin em rastî malbateke tîn ku ji avahiyeke 8 qatî eşyayên xwe derdixînin.

Piştî ku em silaw didin wan, 2 jin nêzîkî me dibin û di heman demê de dest bi axaftinê dîkin.



Li taxa Muradiyeyê jinek li mala cîranê xwe mêze dike.dikin

## “Yê mane jî wekî me necar in..”

*Ka ji xêra xwedê halê me binivîsîn. 18 roj e em perîşan bûne. Ji avahiya me re dibêjin xisar tê de heye. Em her şev diçin li mizgeftê radizên sibehê tîn li xaniyên kirê digerin. Ji ber tirsê erdhêjê em nekarin bikevin avahiyê. Em niha digerin nagerin xaniyeke kirê nabînin. Yê hene jî kirêya wan du sê kat in. Di vir de kesek nemaye yê. Yê mane jî wekî me neçar in.*

Aycan Menteş tenê ji wan malbatan ye ku ji ber neçariyê nizane çî bike.

Ne kare ji xanî derbikeve ne jî dikare têkevê.

Ew û birazya xwe çentê li piştê wan ji me dur dikevin.

Navçeya Baglêra ya Amedê di salên 90an de gelek koç girtiye.

Him ji kesên xizan re û him jî kesên koç kirine re bûye war.

Em di kolanên Baglêra de rastî yek ji wan malbatan tîn.

*Me di salên 90an de ji Licê koçî vira kir. 30 sal e em livirin. Me bi zor û zehmet ji xwe re xaniyeke girt û niha jî ew jî ji destê me çû. Min xaniyek kirê kir 6 hezar lîre dixwazin. Ka em ê çawa bikin. Em naçar in neçar...*

Wekî kekê Şîkrî bi sedan kes di rê ya koçberiyê de ye.

Piştî erdhêjê ji navçeyê rojane bi dehan mal xaniyên xwe bar dikin û ber bi ciheke din ve diçin.

Li gor reqamên fermî li bajarê ji bo hezar û 100 avahiyan biryara hilweşandina bî lezgin hatiye dayin.


Xisara herî zêde jî li navçeya Baglêra ye.



Yek ji wan kesên ku mala wan erdhêjê de xisar dîtîye- Aycan Menteş



Şênîyê taxa Muradiyeyê Aycan Menteş û birazyê wê



Kekê Şîkrî avahiya xwe ya zirar dîtîye nişan dide



# Roja 18emîn ya erdhêjê

Beril Caymaz 📅 Sibat 23, 2023

Erdhêja 6ê Sibatê 18 rojan li du xwe hîşt.

Hejmara kesên jiyana xwe ji dest da jî rojane bilind dibe.

## 6 pisîkên ku li Galerîayê asê mabûn bi xebata ekîba AFADê hatin xilaskirin

2 bloka Sîteya Galerîayê di erdhêja 6ê Sibatê de hilweşiya. Ji bo blokên mayî jî biryara hilweşandina bikontrol hat dayîn. 6 pisîkên ku li qata 9emîn asê mabûn bi xebata ekîba AFADê hatin xilaskirin.

## Walîtiya Meletiyeyê: Hejmara avahiyên ku di erdhejê de hilweşiyên 3 hezar û 437 e

Li gorî daneyên li ser hesabê Twîterê yê Walîtiya Meletiyeyê hatin parvekirin. Li parêzgehê heta îro 3 hezar û 437 avahî hatine hilweşandin. 19 hezar û 822 avahî xisareke mezin dîtine. 2 hezar û 79 avahî jî xera bûne. Hejmara avahiyên ku bi lezgîni bûn hilweşandin bû 527.

## Jimara mirîyan derket 43 hezar û 556 kes

Wezîrê Karên Navxweyî ya Tirkîyeyê Suleyman Soylu ragihand ku hejmara kesên jiyana xwe ji dest dane derket 43 hezar û 556an.



# “Wekî ku rojên me yê berê hildiweşînin”

Beril Caymaz 📅 Sibat 22, 2023



Li Amedê xirakirina avahiya Galerîayê dest pê kir.

Li ser wê avahiyê 4 blok hebûn û bi sedan mirov tê de dijîyan.

2 bloka Sîteya Galerîayê di erdhêja 6ê Sibatê de hilweşiya. Ji bo blokên mayî jî biryara hilweşandina bikontrol hat dayîn.

Malbateka bi sê zarokan re beriya erdhêjê li wir dijîyan jî li benda xirakirina mala xwe bûn. Ew bûn şahidê wê xirakirinê.

Jina ku li mala wê wêran bûye bi kelogirî jî Botan Times re axivî:

*Piştî erdhêjê me derî vekir da ku em ji malê derkevin, lê asansor û direncek hilweşiyabûn. Em dîsa vegeyîyan hundir.*

*Me bi zarokên xwe re qolonan hembez kir. Diwar hildiweşiyên. Piştî demekê îtfaiye korîdorek çêkir û em daxistin jêr.*

*Zarokên min pêxwas derketin derve.*

*Bi rastî mesele ne mal e. Yek fotografekê zarokên min tune ye di destê min de. Ez nikarim bîranînên xwe vegeyînim. Wekî ku rojên me yê berê hildiweşînin. Ji vir temaşekirin pir zor e.*

*Zarokên min ji wê şevê heta niha nikarin razên. Carinan tiştêkî jî nabêjin. Zarokên min her tim xwe di nav erhêjek de hîs dikin.*

*Niha malê ku em lê dimînin de tenê nivîn û balgîvên me hene. Em ê ji nû ve dest pê bikin.*

Keçeke 6-7 salî ya bi qapûtê pembe jî li ber kavilan bû. Vê ji hevala xwe re malê xwe îşaret dikir û digot:

*Binêre televîzyona me ji vir tê ditîn. Ew ê li wir jî qoltixên me yên şîn in.*

# “Jiyana me, mala me, Tv û radyoya me bû, niha ew jî çû”

Gulistan Korban 📅 Sibat 22, 2023



Gerînendeyê Weşana Can Radyo Tv yê  
Ahmet Dalgıç



Yek ji avakarê Ajansa Surê  
Rojnameger Arîf Bulut

*Me di sala 1993an de dest bi weşanê kir. Ji wê salê heta îro tû carî weşana me ewqasî nesekinî ye. Erê em bişans in ku em dijîn. Lê jiyana me, mala me, Tv û radyoya me bû. Niha ew jî çû.*

Ahmet Dalgıç

Gerînendeyê Weşana Can Radyo Tvyê Ahmet Dalgıç, piştî erhêjê rewşa televîzyona xwe bi van gotinan tîne ziman.

Buroya wan jî di avahiya Galerîayaya Amedê de bû ku niha tê xirakirin.

Erdhêjê wekî gelek kesî tesîrê li hembîşeyên me jî kir.

*Avahiya me ya Can Radyo-Tvyê ji sala 2002an vir ve li Galerîayayê ye. Di erdhêjê de li bloka me tu zirar û zîyan çênebû. Li gel wê jî destûr nehat dayîn ku em bikevin avahiyê û amûrên xwe yên weşanê bigrin. Niha tu tişteke me*

**DUYURU**



DİYARBAKIR DİYAR GALERİA'DA  
YAYIN YAPAN BÖLGEDE 35 YILDIR  
BÖLGENİN SESİ OLAN  
CAN TV VE CAN RADYO YAYINI  
YAŞADIĞIMIZ DEPREM FELAKETİ  
SONUCU DİYAR GALERİA DA  
YAŞANAN YIKIMDAN KAYNAKLI  
BULUNDUĞU YERİN HASAR  
GÖRMESİ NEDENİYLE  
YAYIN YAPAMAMAKTADIR

*nema. Hemû amûrên me yê wêşanê di wê avahiyê de ye. Kirîna wan jî gelekî zehmet e.*

*Gerînendeyê Weşana Can Radyo Tv yê Ahmet Dalgiç*

### **“Li cihê ku ewqas eş têne kişandin...”**

Di avahiya Dîyar Galerîyayê de buroya Ajansa Surê jî hebû.

Ajansa Surê ku beriya du salan hatibû damezrandin bûroya wan jî dê di binê xirabeyên avahiyê de bimîne.

Di dema xirakirina avahiya Galerîyayê de em rastî yek ji avakarê ajansê Rojnameger Arîf Bulut tên.


Bulut li ser xirakirina avahiya ku buroya wan jî tê ye ji me re wîha dibêje;

*Ajansa Surê, min û hevlekî xwe me bi keda xwe avakir. Avahiya ku buroya me jî tê de ye niha wê bê hilweşandin. Erê hin tîştê me di hûndîr de ye. Lê li cihê ku ewqas eş têne kişandin nabe em behsa van tiştan bikin.*

Rojnameger Arîf Bulut

Rojnamegerên li herêmê jixwe zehmet karê xwe dikirin.

Pîştî erdêjê barê wan girantir bû. Ji cihê û amûrên xwe yên teknîkî jî bûn.



# "14 kûçik û pisîk di vê avahîyê de hene, xera nekin!"

📷 Murat Bayram 📅 Sibat 22, 2023

Parastvanên mafên heywanan xebatên ji bo xerakirina Diyar Galeryayê sekinandin. Konseya Mafparêzên Heywanan diyar kir ku di avahiyê de 14 pisîk û kûçik hene.

Diyar Galerya yek ji zê detîrî hezar avahiyên e ku ji ber erdhêjê zerer lê bûye. Du blogên wê di erdhêja yekem û duyem de xera bûbûn. Bi jimareka fermî nehatiye eşkerekirin lê bi dehan mirov di avahiyê de miribûn.

Parastvanên heywanan dibêjin "heta xebat ji bo mirovan hebû me dengê xwe nekir. Vêca dora heywanan e."



Di dema protestoyan de di qeta serî ya avahiyê de pisîkekê xuya dikir



Xebatên ji bo xerakirina Diyar Galeryayê sekinîn.

# Roja 17emîn ya erdhêjê

Gulistan Korban 📅 Sibat 22, 2023



Hejmara kesên di erdhejên bi navenda Mereşê de jiyana xwe ji dest dan derket 42 hezar û 310an.

Serokatiya Rêveberiya Afet û Rewşa Awarte (AFAD) li ser rewşa heyî daxuyaniyek belavkir.

AFAD ragihand ku li Mereş, Antep, Riha, Amed, Edene, Osmaniye, Hatay, Kilîs, Meletî û Elezîzê bi tevahî 448 hezar û 18 kes hatin tehliyekirin.

## Ji kar derxistina karkeran hate qedexa kirin

Bi biryara Serokomar Recep Tayyîp Erdogan li 10 parêzgehên ji kar derxistina karkeran hate qedexa kirin.

## Wezîr Soylu: Dê ji bo wan mirovên li herêma erdhêjê alîkarî bèn kirin

Wezîrê Karên Navxweyî Suleyman Soylu dîyar kir ku ketina malên ku ji erdhejê zirareke mezin dîtine qedexe ye.

Soylu got, "hem AFAD û hem jî Wezaretê Malbat û Xizmetên Civakî dê eşyayan bidin wan malbatan."

## Ji muxalefetê li dij gotinên Erdogan bertek

Serokomar Recep Tayyîp Erdogan, ji bo kesên kêmbûna alîkariyan rexne dike peyvên, "bêexlaq, bêrûmet," bi kar anî bû.

Li hemberî gotinên Erdogan muxalefetê jî got, "Xeberan nede, îstifa bike."

# Endezyarê Jeolojîyê: Bajarên me li ser xetên fayê hatine avakirin

Gulistan Korban 📅 Sibat 21, 2023




Piştî erdhêja 6ê Sibatê ku li Mereşê pêk hat, li gor daneyên AFADê heta niha 3170 erdhêjen piçûk çêbûn.

Pispor dibêjin dê lerzên piçûk heta saleke berdewam bikin.

Endazyarê jeolojîyê Umit Eke jî ji Botan Tîmesê re dibêje, divê mirov hişyar û baldar bin. Erdhêj dê berdewam bike.

*Divê em ferî erdhêjan bibin. Em ferî wan bibin û bi wan re bijîn. Ger em tedbîrên xwe bigrin û li gorî wî tevbigerin wê demê erdhêj nakuje.*

Endazyarê jeolojîyê Umit Eke



## Çewlîk û bajarên derdora wê divê hay ji xwe hebin”

Li gor endezyar Umit Eke, erdhêja bi pîleya 6.4 ya li Hatayê çêbû erdhejê serbixwe bû. Erdhejên bi vî rengî dê berdewam bin.

Eke welatîyên li Çewlîk û derdora wê jî hişyar dike ê dibêje,

*“Welatîyên li Bîngolê û derûdora wê bila hay ji xwe hebin. Xeta fayê bi jêr ve enerjîya xwe valakir. Niha em li bendê ne bi wê aliyê ve biçê.”*

Tirkiye li ser xeta erdhêjê ye. Gelek bajar di warê erdhêjê de xwedî rîskek zêde ne.

Li ser sedema wî jî Eke diyar dike,”

## “Bajar li ser xetên fayê hatine avakirin”

*Ji ber ku bajar li ser xetên fayê hatine avakirin, nelêrtiyên di çêkirina avahiyên de û aştîya îmarê, bi xwe re encamên xedar anî.*

Endazyar Eke

Endazyar Eke jî bi xwe xelkê Mûşê ye. Demeke li ser tesîra erdhêjê ya li ser bajarê xwe serê xwe êşandiye.

Di sala 2015an de li ser rîska erdhêjê ya li ser bajarê Mûşê raporek amade kiriye.

Lê rapora ku pêşkeşî şaredariyê Mûşê kiriye bala tû kesî nekişandiye.

Endazyarê Jeolojîyê Eke dibêje, “welatê me li ser xeta erdhêjê ye” û van hişyarîyan li welatiyan dike:

*Du erdehejên mezin çêbûn dê paşlerzên wî jî dirêj û bi tundî bin.*

*Ger erdhêjêk çêbibe divê panîk neyê kirin û bikevin ciheke biewle.*

*Cihê ku agir, ketin an taluke hebe ji wana durkevin.*

*Avahîyên ku di sîstema wî ya barkêşiyê de (taşiyıcı sistemler) xesarek hebe divê kesek nekeve hûndirê wî.*

*Niha rêzîka sereke ew e ku di avahîya da qolon û kîrîşande zirar heye an tûneye divê ew bê tespît kirin.*

*Tiştta ku avahîyê li pîya digre ev in. Lê bi sere xwe ev tenê ne bes e tabî.*

Erdhejên bi navenda Mereş ên di 6'ê sibatê de li 10 bajaran rê li ber hilweşîneke mezin vekir.

Heta niha 41 hezar û 156 kesan jiyana jiyana xwe ji dest da.




Ümit Eke

@Eke\_Umit · Follow



2015 yılında Muş paftasının merkezi kısmında deprem için yatay yer ivmesi projesi yaptım. Muş belediyesine götürdüm ama kimse projeye bile bakmadı. Projeyi ücretsiz katkım olsun diye verdim ama kimse oralı olmadı @Feyat\_ASYA, @MusBelediye, @TCMusValiligi #deprem



# Roja 16emîn ya erdhêjê

Beril Caymaz , Gulistan Korban 📅 Sibat 21, 2023



Di ser erdhejên bi navenda Mereşê çêbû bû sedema mirina zêdeyî 40 hezar kesî.

Li gel bi ser erdhêjê 16 roj derbas bûn û vê carê jî li Hatayê du erdhejên din ên dijwar hejand.

Êvara duşemê ewil di saet 20.04an de navenda erdhejê li navçeya Defne ya Hatayê bi pileya 6.4 bû. Piştê saet 20.07'an li navçeya Samandag a Hatayê bi hêza 5,8 erdhej pêk hat.

## Heta niha 20 hezar Sûriyeyî vegeyriyane

**15.30** Wezîrê Parastina Neteweyî Hulusî Akar got : "Hemwelatîyên Sûriyeyî hene ku ji Tirkîyeyê ber bi Sûriyeyê va vedigerin cih û warên xwe. Em li pey vê reqemê ne ku heta niha 20 hezar kesan derbas bûye."

**Serokomarê Almanya Frank-Walter-Steinmeier bo cara yekem bi zimanê Kurdî peyamek derbarê erdhejên li Mereşê de belav kir.**

**14.38** Serokomarê Almanya Frank-Walter Steinmeier spasiya tîmên ku di erdhejê de alîkariya mirovan dikin kir û got: "Mirovatiya ku hûn di vê dema tarî de nîşan didin, hêvî û baweriyê dide mirovan."

Steinmeier di dawiya peyama xwe de bi Tirkî, Erebî û Kurdî ev wiha nivîsî:

"Biz her zaman yanınızdayız.

Nabqqa bi-janibikum.

Emê li cem we bin."

## 3 kes mir, 213 birîndar e

Wezîrê Karên Navxweyî Suleyman Soyly diyar kir ku di erdheja Hatayê de 6 kesan jiyana xwe ji dest dane û 294 kes jî birîndar bûne.

Şaredarên her du navçeyan banga pêwîstiya lezgîn ji bo konan ji bo herêmê kirin.

## Her du Wezîrên Almanya îro bîna herêma erdhejê

Wezîra Derve ya Almanya Annalena Baerbock û Wezîra Karên Hundir Nancy Faeser dê îro (Sêşemê) ji bo serdana herêma erdhejê bîna Tirkîyeyê.

Di vê serdanê de Berdevkê Wezaretê Derve got ku her du wezîr dê ji nêzik ve rewş û xebatên alîkariyê yên li herêmê erdhêjê bişopînin.

## ESCD "Herêma erdhêjê de dibe ku nexweşiyên infeksiyonê derkevin."

Navenda Pêşîlgirtin û Koltrolkirina Nexweşan a Ewropoyê (ECDC) hişyarî da ku piştî erdhêjên ku li Tirkîyê û Sûriyeyê zîrê mezî gihandine herêma erdhêjê, dibe ku nexweşiyên infeksiyonê derkevin.

# Erdhêj û penaberî

Gulistan Korban 📅 Sibat 20, 2023



Erdhêj li 10 parêzgehan bû sedema wêraneke mezin.

Piraniyan niştêcîhên wan parêzgehan jî xelqên Suriyeyî bûn.

Tê gotin ku di erdhêjê de ji wan 5 kesên jîyana xwe ji dest dane teqez 1 Suriyeyî ye.

Li Antakya, Mereş, Riha, Dîlok, Nurdaxî, Îslahiye, Kirikhan û Samandagê bi hezaran Suriyeyîyan jiyana xwe ji dest dan û hê jî di bin xirabeyan de ne.

Di rojên erdhêjê de li ser malperên civakî û ji aliyê sîyasetmedaran ve gelek gotînen dijêti hatin kirin.

Ji ber wê rewşa heyî hin kesên di bin xirbeyan de mabûn, ji ber Tîrkî nezanîbûn bî Erebi neaxivîn.

Wan kesan dîyar kirin ku “Me got eger em bi Erebi biaxivîn dibe ku me rizgar nekin.

Me tenê deng derxist.”

Van gotinan jî encama dijêtiya li hember kesên ji Suriyeyê radixe ber çavan.

## **Wekî talankar hatin pêname kirin**

Konên ji bo Suriyeyan hate dayîn jî di malperên civakî de bû rojev.

Bikarînerîn medyaya civakî wekî, “Konan didin Suriyeyîyan” wan kesan teşhîrkirin.

Her wiha li herêmên erdhêjê wekî talankar hatin pêname kirin û li dijî wan kampanya hate dest pêkirin.

## **Nekarin gor bibînin!**

Li gor agahiyên Taha El Gazî ku li ser bînpêkirina mafên Suriyeyîyan kar dike dide rojnemaya Kararê,

Heta niha 6 hezar 100 penaberên Surî ji ber erdhêjê canê xwe ji dest daye.

Li gor agahiyên parve dike wan kesên di erdhêjê can daye ji bo binaxkirinê gor nedîtîye.

Beriya 12 salan ku şerê naxweyî ya Suriyê dest pêkir li gor reqamên fermî nêzîkî 4 mîlyon Suryeyî li Tirkîyeyê bi cih bûn.


### **Bi sedan vedigerin Suriyeyê**

Bi sedan Sûriyeyiyên ku li Tirkîyeyê dijîn piştî erdhêjê hefteya borî çûn Suriyeyê.

Li gorî nûçeya BBCyê, hikûmeta Tirkîyê heta 6 mehan rê da Suriyeyiyên bixwazîn ji Tirkîyeyê derkevin.

Ev guhertin bû sedem ku bi sedan kes li ber deriyên sînor bi saetan li dorê bisekinin.

Hin kesên ku ji erdhêja hefteya borî rizgar bûne diçin deriyên sînor. belkî ji bo ku bi endamên malbata xwe re li Sûriyê, yê ku bi salan wan nedîtine, bigihînin hev.



# Roja 15emîn ya erdhêjê

Gulistan Korban 📅 Sibat 20, 2023



Binnivîsa Wêne

Erdhêja 6ê Sibatê 15 rojan li du xwe hîşt.

Hejmara kesên jiyana xwe ji dest da jî rojana bilind dibe.

Li Semsur, Mereş û Antakayayê rewş ji bo mirovan hêj dijwar e.

## Dîroka vekirina dibistananan dîyar bû

Wezîrê Perwerdehiyê Mahmut Ozer da zanîn ku ew ê li bajarên Edene, Kilis, Amed û Rihayê di 1ê Adarê de dest bi perwerdehiyê bikin.

Li bajarên Dîlok û Osmanîyeyê jî dîrok heta 13 Adarê hate dîrêj kirin.

## AFAD: 41 hezar û 20 kesan jiyana xwe ji dest dan

Li gor daxuyaniya nivîskî ya AFADê, piştî erdhejên ku navenda wan navçeyên Pazarcik û Elbîstana Mereşê çêbûn 6 hezar û 212 erdhejên biçûk pêk hatin.

AFAD, di erdhejan de 41 hezar û 20 kesan jiyana xwe ji dest dan.

## Akşener diçe Diyarbekirê

**10:32** Seroka ÎYÎ Partiyê Meral Akşener dê îro li Amedê heremên erdhezdeyan ziyaret bike. Akşener di bernameya xwe ya ku wê di saet 13.30an de dest pê bike dê biçê qadên kon ên ji bo mexdûrên erdhejê hatine vedan û her wiha serdanên sersaxiyê.

## Wezîr Akar bertek nîşanî îdiayan da

Wezîrê Parastina Neteweyî Hulusî Akar der barê îdiayên ku piştî erdhejê leşker dereng ji qereqolê hatin derxistin got: "Îdiayên alîgir ên ku rastiyê nîşan nadin bi niyeta baş nayên îzahkirin. Wezaretê Parastina Neteweyî lezand. ji kêliya yekem ve gel."

## **Kiliçdaroglu: Zanîngehan vekin**

*Serokê Giştî yê  
CHPê Kemal  
Kiliçdaroglu  
rexneyên  
xwe yên li ser  
derbasbûna  
perwerdeya ji  
dûr ve ya li hemû  
zanîngehên  
welêt didomîne.*

*Kiliçdaroglu  
ji hikûmet re  
bi armanca  
mexdûrên  
erdhejê li yurdên  
dewletê bi cî  
bikin didomîne.*

## **Li Semsûrê li goristanekê tenê 7 hezar û 500 cenaze hatine definkirin**

*Li Semsûrê ku hê  
jî hejmara kesên  
di erdhejê de  
jiyana xwe ji dest  
dane tam nayê  
zanîn, heya niha  
li goriyanekê  
tenê 7 hezar û  
500 welatî hatine  
definkirin.*

## **HDPê bang li xwediyê xaniyan kir: Heqê kirêyan biha nekin**

*Hevserokên  
Giştî yên HDP'ê  
Pervîn Bûldan û  
Mîthat Sancar,  
ji bo mexdûrên  
erdhejê hîn bêtir  
mexdûr nebin  
bang li xwediyê  
xaniyan kirin ku  
heqê kirê biha  
nekin.*

